


# XARIS BEDLÎSÎ Û HELBESTA XETEN



● Salihê HEYDO

Gelek helbestavanê Kurd ên kilasîk hene û xwediyên berhemên binirx in, lê sed heyf û mixabin ku gelek ji berhem û helbestên wan winda çûne ji encama zor û zînata ku li ser çand, ziman û wêjeya Kurdî û millet bi giştî de ji hêla desthilatdarên li ser Kurdan û Kurdistanê, nehatine parastin û talan bûne, lê carinan bext lê dixê ku mere di rîya rasthatîneke nepêşbînkirî re li hin berhemman ji wan berhemên bi nirx rast tê. Lewra di vê lêkolîn û gotarê de ez dixwazim helbesteke windayî ji

helbestên helbestvan û zanayê mezin Xarisê Bedlîsî weke nimûneyeke nepeyda û nebîtir ji xwendevanên kovara Sîwanê re daxînim da ku ez kevirekî ji devê rêya astengiyê di vî derbarî de bidim alî.

Lewra ez vê helbestê pir giranbuha, binirx û zengîn dibînim ji hêla avakirin, naverok, pend û wateya xwe ve.

Ev helbest ji feqe û mellayên ku di hucreyan de dixwendin gihaste destê min di sala 19762an de ku



ya Xarisê Bedlîsî ye, lewra heya nuha ez di tu pirtûk û lêkolînan de lê rast nehatime, çendî jî min berhemên Xaris xwendine min ev helbest nedîtiye ji bilî Yûsiv û Zelfîxe û Leylê û Mecnûn pê ve, lê dema ji nav pirtûk û defterê Melle Mihemedê Weys gihaşte destê min, gotin helbesta Alimekî Bedlîsî ye û ev helbest di derbarî sinetkirina kurê mîrekî ji mîrekên Bedlîsê de ye û şahî û tiştêkî seyr û kesnedîtî di naveroka wê de eşkere dibe. Lewra ez dixwazim ji we re daxînim û hûn jî dîtin û têtîniyên xwe li ser bînin ziman, dibe ku hayê hinekan ji lêkolîneran, ji hin jêder û çavkaniyan di derbarê vê helbestê de hebe. Lewra li gorî nerîna min ev helbest ji sedî sed ya Xarisê Bedlîsî ye ji ber gelek egeran weke navê Xaris tê de derbas dibe, navê Mîrê Bedlîsê û Hîzanê derbas dibe her wiha peyv û gotinê

Farisî û Erebi tê de derbas dibin; li gorî çanda zane û helbestvanên me yên di sedsalê navîn û heya sed-sala nozdemîn de. Ev helbesta bi navnîşana xeten ji nav pel û pirtûkên destnivî yên Melle Mihemedê Weys kete nav destê min di sala 1976'an de. Melle Mihemedê jî alimekî olî bû û xwendina xwe li Bexdayê û Mûsilê kiribû di sala 1890'î de li Gundê Zomaniya Şingalê ji dayik bûye, navê wî Mihemedê kurê Weysê kurê Îdoyê kurê Izêrê Heydo ye; ji Eşîra Gabara ye di sala 1977'an de çû ser heqîya xwe niha gorra wî li gundê Hesê Êso ye ku girêdayê devera Amûdê ye. Sê kurên wî hene Hecî Si'îd, Evdilezîz û Hecî Birahîm. Lê berî ku em helbestê bixwînin pêwîst e ku Xaris bê naskirin û em hinek ronahiyê biavêjin ser jiyana wî û serdem û berhemên wî. Xaris helbestvanekî Kurdî kilasîk bû û zana

û rewşenbîrekî serdema xwe bû di sedsala 17-18'an de û ji hozan û ilmdarên Bedlîsê bû, lê sed mixabin pir ji Kurdan vî ciwamêrî nas nakin ji ber agahiyên zêde di derbarî wî de tune ne, tenê çend rêz û agahî li ser hene .

Lewra Navê wî Xarisê Bedlîsî ye û nasnavê wî di helbestên wî de ev in: Xaris, Haris û Sewadî û cih û devera ku lê jiyaye Bedlîs, Hîzan û derdorên Wanê û ji Eşîra Rojka ye ku Mîr Şerefhanê Bedlîsî bi xwe ji mîrêkên Rojka bû û Bedlîs bi xwe jî paytexta wan bû, her wiha cihê ilm û irfan û şaristanî û dibistanên zanistî, wejeyî, feleknaşî û zimannasî û olî bû û zanayên herî mezin û mamostayê bilîmet û pîspor li dibistanê wê waneyên cûrbecûr di her zanistê de didan. Pirofêso Qenatê Kurdo di pirtûka xwe ya bi navê Tarîxa Edebyeta Kurdî de li ser zimanê M-B- Rodênko dibêje ku: Xaris di sala 1758'an de ji dayik bûye, lê wexerkirina wî nexuya ye. Her wiha qunsilê Rûsî Aliksender Jaba, vê yekê cih bi cih dike. Lê jêderên weşanxaneya Roja Nû ku li paytexta Siwêde Stokholmê bû tînin kifşê û dibêjin ku Xaris di sala 1700'î de ji dayik bûye û di sala 1775'an de çûye ser heqîya xwe. Her wiha Xaris xwendina xwe li bajarê Bedlîsê kiriye û ji derçûyên wan dibistanan bû bi pillaya herî bilind; di zanistên olî, stêrnasî, heftqelemro (Erdnîgarî),

pîvanbasî (ilmulqiyas), serf û nehû û yên helbesthûnanê û hin zanistên dîtir weke zimanê Farisî ,Erebî û Tirkî bi taybetî di dibistanên Şeref-xaniyan de weke dibistana Şemsiyê ku navdartirîn dibistan bû li Bedlîsê di gel ya Şerefyê. Her wiha Feqe Huseyn Sagniç di pirtûka xwe de ya bi navê Dîroka Wêjeya Kurdî de dibêje ku Xaris ji navenda bajarê Bedlîsê bi xwe ye û di rojên şahî û cejnan de helbestên bi dengê zîz û zelal dixwendin bi awayekî stranî û dengê wî pir xweş bû lewra li nav bajêr digerrîya û ew digotin û kêfa xelkê pir jê re dihat û jê re bi kêf û eşq li çepikan didan. Lewra pirtûkên wî û helbestên wî li wan dibistanan û hemû dibistanên wê deverê dihatin xwendinê û rêberê dibistana Şîraziyê bû.

Her wiha bi helbestên Ehmedê Xanî û Selîm Silêman bandor bûbû nema-ze ji hêla têşeya helbestên durêzî de ku destane bi wan dihatin nivîsandin û hûnanê weke: Destana Mem û Zîna Ehmedê Xanî, Seyfulmilûka Siyapoş û Leylê û Mecnûna Selîm Silêman. Lê ji berhemên Xaris ku niha di nav destên me de hene destana Ûsif û Zelfîxe û Leylê û Mecnûn in .Lewra Qenatê Kurdo û Margirêt Rodênko dibêjin ku ev destane Selîm Silêman beriya Xaris Bedlîsî nivîsiye, lê bi zimanê Farisî, lê dema Xaris helbesta Leylê û Mecnûn dixwîne keçîkek Bedlîsî jê re dibêje tu çima wê bi



Farisî dibêje? Em bi Farisî nizanin, gerek tu wê bi zimanê me yê Kurdî bixwîne da ku em têbigihên. Lewra li gorî daxwaza wê keça rind û bedew ku hinavê wî ji hezkirinê sotiye Xaris helbesta Leylê û Mecnûn û Yûsif û Zelîxe dike zimanê Kurdî.

Û wiha sedema nivîsîna wê di vê helbestê de dibêje:

***El qisse di vê buhara gulhêz  
Ez bûme li nivê yekê dilavêz***

***Rûniştîbûm û ez li pencera yê  
Fikirî bûm li siharê û hewayê***

***Niga mi dî derî kişa bû  
Şemsek ji nivê mi ve a'la bû***

***Ji ewwil ve silav û merheba kir  
Pirsa me kir û dilê mi şa kir***

***Rûnişt û bi leb kerem meşref  
Exbar û qise kirin mesref***

***Esrif kirin ji ber kelimê  
Behsa me ghiştê vê miqamê***

***Ku şî'ir û wezin çî xweş kelim in  
Meqbûl cume'eyê Xas û a'm in***

***Nasil li me kir kemalî texlîf  
Elhah û teselefe bittesif***

***Pirsî me wê miraz mikûnê  
Go tercimekî ji Leyl û Mecnûnê***

***Kurdî tu ziringî da bizanim  
Lo ez çî bi Farisî nizanim!***

Lê mijara herî sereke di vê gotarê de ew e ku ez helbest li ser sinetkirina kurê mîr daxînim ku Xaris ew bi çî dîmen û hûnanê aniye zimên û xwestiye wê bi deng û reng wê şahiya seyr û balkêş bîne ber çavê me weke dîdevanekî ku li ser hazir û vexwendî di nav wê mehrecana piralî û neyeksan de.

## **HELBEST**

***Xelkno guhdar bin li vê meqamê  
Ba şî'irê bêjim bo xas û a'mê***

**Ba tiştê dîtîm seyr û e'cîbe  
Li gor emîran ne pir xerîbe**

**A'det û i'rfan, dîn û diyanet  
Helal û heram bûbûne subbet**

**Li me'ideba mîr hatim hizûrê  
Xelk diyarî bûn ji bo tihûrê**

**Ferzendê biçûk mîrzadê resen  
Ferzendê mîre da bînin xeten**

**Tev bûk û zerî xatûn û xanim  
Perîzade bûn ji neslê hakim**

**Libsê diwana herîr û dîbac  
Zêrê bi wan ve sed xerc û xerrac**

**Ew duxte mîr in, naz û perîne  
Tev horegurc in xob û zerîne**

**Xuşrên xewatîn, siteyleise  
Kerîmê mîr in çira Bedlîse**

**Boşî li balan, kêmxwe û sundis  
Belexşanebûn qozaxê Faris**

**Tev surperîne, hemî hore bûn  
Dîbaqeba bûn tev mexmûre bûn**

**Gurcî û axçîk nedbûn munafis  
Suhtin ewana hinavê Xaris**

**Ji têk hatibûn lîz û semayê  
Bi wê pertewê, bi wê senayê**

**Meydan buhişte, nûr jê tecella  
Çi hêr û menzer, subhan ji ella**

**Exter ji ezmên tanîne xwarê  
Cinsên Hewane fêslê buharê**

**Feqîh û suxte tev cilsipî bûn  
Çi taximin ew, Muhemmedî bûn**

**Rezîm dikutan feqîh û suxtan  
Def û xelîlan medîh û xweşxwan**

**Da ev xeten bibe tev xêr û berket  
Bo mîrê biçûk saxlem be sinnet**

**Pê re dixwendin sûreyê qur'an  
Tev du'ago bûn bo mîrê Hîzan**

**Li ser maseyan goştê koviyan  
Falûzic û qend bi dest sofiyan**

**Teyfikên zêrîn tev cameferfûr  
Şerbet bi sed reng celbe bûn ji dûr**

**Êmîş û meywe xweşmûç û rewaq  
Şubhet şerabe ya hilwel mezaq!**

**Şehsiwarên mîr bi qoş û cirîd  
Hevrind bezandin bi çeşman mi dîd**

*Şûrkêş û rimbaz dibûne Qembîz  
Ba pehlewani meydan kirin lîz*

*Hîzan û mahewl hemî li hev ket  
Roja cemayê ba in qiyamet*

*Dengê ney û def ezman hejandin  
Qanûn û çengan mêrxo firrandin*

*Terefek ji wê cinneta baqî  
Terefê digêr tev xemr û saqî*

*Bi perr û perwaz, bi qîşt û qûtîn  
Hatî hizûrê bûne hemneşîn !*

*Hinan digotin ev gulistane  
Hinan digotin kafiristane*

*Mixbece'înan mey digerrandin  
Ji serê 'aşiqan hiş difirrandin*

*Hemîşe bezme teze dîkin rûh  
Li dil dewa ye yaxûdê mecrûh*

*Mîrzade û key bûbûn terrennuh  
Seyrên suxengo kirne tebbeccuh*

*Perrû û xil'et sed reng û sed gûn  
Hemî dihatin bo mîrê mextûn*

*Hemyan bi hev re bi rêz û meylê  
Pêlên sersemî hatibûn seylê*

*Ji zêr û cewher, durr û mirarî  
Hin bi peyayî him bi siwarî*

*Yekî digotî Qerman Qetîl im  
Dîger digotî nezerke fîl im*

*Ji Tello û Se'ired tanîne berber  
Ocazadene, neslê pêxember*

*Yekî digotî Rustemê Zal im  
Li vê dunyayê ez bêmişal im*

*Hemî nefayis li ser reşandin  
Seraya emîr sena weşandin*

*Gewd û serî tev bûbûn muqendel  
Mejjî û cumcum jêk bûne e'izel*

*Lewra mîsale ev celeb xeten  
A'detê kurd in bêgeft û suxen*

*Ew zeriyan naz bi tinaz û fîq  
Bi wan dikenyan her bi tîqe-tîq*

*Mîr daye ferman ku ez quba kim  
Ismê piyamber ez lê numa kim*

*Bûbûne têkil ew cînet û doj  
Hew tê xuyanî ne şeb û ne roz*

*Ev ferman hemî bi destê mîre  
Ew sergevaze, ew destegîre*

*Ez pir de'îf im bindestê mîr im  
Belê A'lim im jê re esîr im*

*Ez bi xwe mayim e'cîb û heyran  
Mîsal nedî bû ev renga xîtan*

*Bi wê dîmenê ez bûm muşşewweş  
Du çeşmên siyah ez kirme serxweş*

*Min ba xoy digot e'srê Micûse  
Devê nedîman kasan dibûse*

*Min pir nedidît ji bo xwe layiq  
Lewra li wê de ez bûme a'şiq*

*Nemaz û lavij dibûne suhbet  
Sersem û xoşan girtine secret*

*Ew duxt û nazik tev reqsebaz bûn  
Pir dilbuhar bûn em dilnewaz bûn*

*Li seraya mîr ev bû beyanî  
Nesleya mîran çîna li banî*

*Hemî bi E'şq û xurroş û bade  
Sema girtibûn ted'go mî'ade*

*Ji le'ilên perî badeyek noşand  
Bi destê nazik rayî mi hoşand*

*Rewal û nazan li hev bi xemz in  
Xemzê A'şiqan ji dil re remz in*

*Nîvê şeva din qemer li çardan  
Hatî hundirû bi e'şq û serdan*

*Naz û perîkê nuhtî dilê min  
Bi tîra e'şqê der kir kulê min*

*Ez ba nikarim lew nepirsim ez  
Qarî mûlidim lew Xaris im ez*

*Riftar wê dida bi xemzebazî  
Wê duxtemîrê çendî bi nazî*

*Qet min nebîna ev şikl û hêre  
Tenê surperî li min dinêre*

*Xulam û yawir rehtin ji ser xwe  
Hemî meylebûn maqûl û keyxwe*

*Cemî 'ê hatin kêf û semayê  
Şarik muşarik li vê sena yê*

*Cumla hizûran serxweş û mexmûr  
Şingîna kasan sedayî da dûr*

*Mid' go cemî'en ji bo mi dane  
Heyv û sitêrin li min cemanê*

*Bilcumle me'ideb xurroşîme bû  
Di e'rşê sultan mîsalî ne bû*

*Ya reb çi dîde bi vê cemalê  
Çendî qeşeng in bi vê fesalê*

***Bi kîs û xaban zêr bûne mesrûf  
Roja xîtana sertacê me'irûf***

***Nifşek mezlûm in, beşek zalim in  
Nifşek cahil in, nifşek A'lim in***

***Iqlîmê Hîzan deh salên tamam  
Eborbesteban bi wê xas û a'm***

***Nifşek talib in, nifşek metlûb in  
Nifşek xalib in, nifşek mexlûb in***

***Aya xiyale yaxud jî xewne  
Seyra mi bîna sinetul kewne***

***Nifşek tarid in, nifşek terîd in  
Nifşek hebîb in, nefşek bexîd in***

***Wisa ye gerdûn ne yek meqame  
Nifşek helale, nifşek hermae***

***Nifşek hemîm in, nifşek belîd in  
Nifşek qerîb in, nifşek be'îd in***

***Nifşek siyahe, nifşek beyaze  
Nifşek xulame, nifşek firaze***

***Enguştî destan ne yek meqas in  
Bi rêz û kom in ji yek esas in***

***Nifşek emîr in, nifşek esîr in  
Nifşek bi mal in, nifşek feqîr in***

***Afrîde nabin yek ray û sîfet  
Qadir nexwestî bike yek ummet.***

***Nifşek bi kêf in, nifşek hezîn in  
Nifşek de'îf in, nifşek bedîn in***

---

#### **Jêder**

1. Tarîxa Edebyeta Kurdî Qenatê Kurdo
2. Filklorê Kurdî Albêrt Sosin
3. Edebyeta Klasîk a Kurdî Jaklîn Mûsaêlyan
4. Gerra peyapey Salihê Heydo
5. Dîroka Wêjeya Kurdî Feqe Huseyn Sagniç